## Kurd hertim bûne mertal bo dagîrkeran

»»» R:10



## Çima şer û şerxwazî bo rejîmê destkevte?

»»» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (439) 04-02-2023Buha (1000) Tûmen

## Di ٧٧emîn Salvegera Komara Kurdistanê da Pêşewa Qazî Mihemed Bangî Kurdên Cîhanê Dike

»»» R:3

## Siyaseta dirust ya Kurdî

»»» R:8

## Daxuyaniya Navenda Hevkarî li derheq erdheja bajarê Xoyê

**Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê li derheq erdheja bajarê Xoyê daxuyaniyek belav kir.**

**Deqa daxuyaniyê bi vî awayî ye:**



Mixabin di heyama hefteya derbasbûyî de, bo çendîn caran erdhejê bajarê Xoyê û gundên derdora wî bajarî ya ser bi parêzgeha Urmiye hejand ku, herî dawî şeva Şemî li ser Yekşemî, 9`ê Rêbenda 1401`an, bi legîzîniya 5.9 rîxtir bûye û erdhejên herî dawî yên piştî wê bûyerê heta serpêdeya îro berdewamî hebûye.

Bi sedema vê bûyerê heta niha sê welatiyan canê xwe ji dest dane, û 816 welatî jî birîndar bûne, piraniya avahiyan bi taybet yên li gundên nêzî navenda ku erdhej çê bûye hiloşîne û amara zirarên berketî her şiqas ku diçe zêdetir dibe.

Rûdana vê erdhejê ev jî li demsala sir û seqem û barînên niha yên navçeyê de pirsgirêkên zêde bo xelkê bajarê Xoyê û deverên derdorê drust kiriye, û bitaybet ku şêwaza bi hawar çûna xelkê û şêwaza bi denghatina navendên hikûmetî, ku nerizayetiyeke zêde ji aliyê xelkê ve li pey hebûye. Lê, her weke berê xelkê Kurdistanê li navçeyên din li hawara daxwazkariyên xelkê bajarê Xoyê û navçeyên erdhej rû dayî de çûne, û pêka şiyana xwe xêwet û xwarin û kelûpelên germkirinê ji wan re dabîn kirine.

Navenda Hevkarî li derheq can ji dest dana wan çend welatiyan hevxemiya xwe digel malbat û kesûkarên wan yên li bajarê Xoyî û derdorê radighîne û nojdarbûna bilez bo berkevtiyên vê bûyerê hêvî dike. Herwisa bi bal dan bi karnameya berê ya navendên hikûmetî û dewletî yên Komara Îslamî di demên wiha de, ku bi xemsarî û desthejandin û gendeliyên xwe, xwe kirine nav birînên xelkê, û ji xelkê Kurdistanê daxwaz dike ku herwek demên berê bi bicih anîna erk û berpirsayetiya mirovî û nîştimanî, barê giran yê vê bûyerê li ser milê zirar berkevtiyên erdhejê li bajarê Xoyî kêm bikin.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê

9`ê Rêbenda 1401`ana Rojî

29`ê Kanûna Paşîna 2023`an

# Çima şer û şerxwazî bo rejîmê destkevte?



N: Nûredîn Sofîzade

Heçî band û girûp û rejîmeke dîktator, bi armanca mana xwe, hertim pişta xwe bi kiryarekê ve girêdane da ku bikarin li jêr bandora rewşa de ku diafirînin, heçî dengeke dijberî xwe, tepeser û mat bikin.

Bitaybetî rejîmeke dîktator û îdolojîke weke rejîma Îslamiya Îranê, ku 44 salan berî niha bi siwarbûna ser pêla hesta Oliya xelkê Îranê û bi mifah vergirtin ji pîroziyên Îslamê, karî bigihîje deshilatê û xwe bi ser Îranê de bisepîne û hemî destkevtên şoreşa xelkê welat ku karîbûn dîktatoriya Paşayetî sernixûn bikin, bi talan bibe.


Dema ku Xumeynî bi hinek dirûşm û qisên xelk xapên karî hevsarê deshilata mutleq bigre dest xwe, û gelek sozên direvîn dabûne xelkê ku dê niha pêde li jêr sîbera wê rejîmê de bigihîne hemî naz û nemetekê û ev rejîm dê hem jiyana dunyewî û hem axiretê bo wan xweş bike, an li jêr vê deshilatê de hemî kesê weke ometa Îslamî dê mafê wekhev hebe, dê belengazî û birsîtî û bêkarî û bê maliyê nahêle, dê Berq, Av, Telefûn, Otobûs, Mesken, bi bê beranber bo xelkê dabîn bike, bi wî awayî karî hemî deshilatê li dest xwe de qorix bike.

Piştre gelek nekêşa ku xelkê Îranê zanî hemî ev qewl û soz direvîn bûne û tenê bo xapandina xelkê bûye, ji bilî hindê, bi hatina ser kar a Xumeynî û rejîma wî, dehan qat ji serdemê dîktatoriya Paşayetî zêdetir dîktatoriyê cihê xwe girt û ji bilî direvîn derkevtina wan sozên Xumeynî, hemî azadiyek û xweşî û mafek ji xelkê hate zevtkirin.

Mafê netewên jêr dest û ziman û çand û olê wan hate qedexekirin, azadiya bîrûbaweran azadiya ehzab, siyasî , rêkxistinî, sinfî, rojnamevanî, nerizayetî derbirîn û … hwd hatine qedexe kirin, xelkê ku şoreş kiribûn û rejîma dîktatora Paşayetî sernixûn kiribûn, dema ku zanîn li ber bayê çûne ber bagerê û ji çalê derkevtine kevtine bîrê de, hêdî hêdî dengê nerizayetiya qat û texên cuda cudaye xelkê welat û part û aliyên siyasî bilin bû.

Di vê navberê de 2 rêk pêşya Xumeynî û rejîma wî bûn bona vê ku bikare deshilata dîktatoraneya xwe ji sernixûniyê biparêze, 1- Yan dibe bi tepeserî û girtin û kuştinê dengê nerizayetiyê mat kiriba 2- Yan dibe welat tûşî şerekê kiriba ku xelk bi malwêranî û xwîn û birîndar û kuştiyên xweve mijûl kiriba û bona vê ku gefa dagîrkariyê li ser axa Îranê heye ji aliyê dujminê derekî, divê hemî Îraniyek bikeve nava hesta berevanî ji welat û dema şer û metirsî jî li ser welat heye, dibe hemî nerizayetî û kêmasî û roj reşî û nebûna azadiyê li navxwe yê welat bê piştguh xistin û wan pirsan bihêlin bo dema asayî, hekî ne li dema şer de heçî kesê dengê nerizayetiya xwe bilind bike weke şirîk û hevdestê dujmin tê hesabê, vê demê çawan seredêrî di gel dujmin tê kirin, ev jî dikeve nava vê hesabê û cezaya nerizayetiya wî, merg û jinav birine.

Ya rast di demeke wisa de Xumeynî rêka dûyem hilbijart, çimku baş dizanî bê tepeseriyê nikare dengê nerizayetiya berfireh ku bilin bibû, mat bike, Xumeynî bi gefên xwe bû sedemê qewmîna şer digel Îraqê ku wî şerî bê encam 8 salan dirêjî kêşa, û Xumeynî ev şer bi nemeteke Îlahî dihesiband ku kariye rejîma wî biparêze, di encama wî şerî de, sedan hezar ji xelkê Îranê hatine kuştin, welat wêran bû, sedan



hezar nuqisan bûn, rojreşî û malwêraniyek bi ser xelkê de anî, ku heya îro rojê xelk li ber dinalîne, ku li jêr sîbera wî şerî de jî bo heyama 8 salan karî dengê neyarên xwe mat bike û wan ji bazina xwe derixe û teswiye bike û rejîmê yêk dest bike.

Ev şerxwaziya rejîmê ku Xumeynî nav jê danaye nemeta Îlahî, û bi dirûşma hinarde kirina îdolojiya xwe anku ( Sidûr Inqilab) bû gefeke mezin bo hemî cîhanê, û rêvîngên rêka Xumeynî jî ku heya îro li ser karin bi mifah wergirtin ji heman bîr û hizra şerxwazaneya Xumenî, jêvene ku dê bikarin bi çêkirina şer û aloziyan, dengê nerizayetî û şoreşa niha ya Îranê ( Şoreşa Jîna ) bikarin xwe ji sernixûniyê biparêzin.

Li dema vê şoreşê destpêkirî heya niha rejîm bi gef xwarin ji welatên weke Îraq, Herêma Kurdistanê, Erebistan, Azerbaycan, Îsraîl û yên din, li pey çêkirina şerekê de ye, jêveye ku hekî şer digel welatekê destpê bike, dê hem hesta parêzvaniya xaka Îranê di nava xelkê Îranê de çêbike, hem dikare li jêr sîbera şer de xwe biparêze, hem dê bikare heçî dengekî bi dijî xwe li navxweyî welat de tepeser û mat bike.

Lê, bîra wan çûye ku serdem guhertin bi ser de hatiye, xelk dizane armanca şerxwaziya rejîmê çiye, û welatên din jî baş hayl pîlan û armancên şerxwazane yên rejîmê bûne, lewma hemî xelkê Îranê û welatên herêmî û cîranên Îranê û bi giştî cîhana pêşkevtî vê carê dest dane destê hev û biryara sernixûniya vê rejîma hov û dîktator û şerxwaz dane.

Ev şerxwaziya vê rejîmê hinek caran bê bersiv namîne, Îsraîl derbên gelek mezin ji rejîmê dane, Azerbaycanê hemî peywendiyên xwe di gel rejîmê qut kirine û balyozxana xwe ji Îranê vekişand, li asta navnetewî de piştgîriyeke berfire ji şoreşa seranserî ya Îranê tê kirin û bi temamî guhertin bi ser helwêst û siyaseta wan de hatiye.

Çêkirina çi şerekê nikare weke şerê Îran û Îraqê hewara parastin û mana vê rejîmê de bê, û bê guman hemî pîlaneke rejîmê eşkere û pûç dibin û gelek nakêşe ku xelkê roj reş yên Îranê bi sernixûniya vê dîktatoriyê xelas bibin û bigihîjine xêr û xweşiyê û ezmûna dû dîktatoriyên derbasbûyî jî, bo xelkê Îranê wisa kiriye ku vê carê tenê sîstemekî hikûmetî ya demokratîk û sikolar û pêşkevtî dikare azadî, wekhevî, bo xelkê bi diyarî bîne.

# Di ٧٧ emîn Salvegera Komara Kurdistanê da Pêşewa Qazî Mihemed Bangî Kurdên Cîhanê Dike



N: Mustafa Ozçelîk

Komara Kurdistanê, 77 sal berê di roja 22.01.1946an, li Meydana Çarçirayê ya bajarê Mehabad a Rojhilatê Kurdistanê hate îlan kirin.
Piştî tecrubeyeke 11 mehan, dewletên mezin, ji ber berjewendîyên xwe rê danê ku Dewleta Îranê di roja 17.12.1946an da Komara Kurdistanê birûxîne.
Serokomar Pêşewa Qazî Mihemed û 15 rêvebirên Komara Kurdistanê di roja 31ê Adara 1947an de li Meydana Çarçirayê ji alîyê Dewleta Îranê ve hatin darve kirin.
Je-Kaf, a ku paşê navê xwe guhertibû bi navê PDK Îran berdewam kiribû, pêşengê damezrandina Komara Kurdistanê bû. Lê Komara Kurdistanê ne tenê komara kurdan bû, herweha komara hemû pêkhateyên etnîkî, dînî, mezhebî, civakî yên li Rojhilatê Kurdistanê bû. Komara Kurdistanê ne bes Komara Mehabadê û ya çend bajarên Rojhilatê Kurdistanê bû; Komara hemû gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê bû.
Komara Kurdistanê bi beşdarîya nûnerên ji hersê perçeyên din ên Kurdistanê hate îlan kirin. Nûnerên perçeyên din ên Kurdistanê jî, bi bîr û bawerî û hişmendî û hest û helwesteke neteweyî, nîştimanî, kurdistanî tevdigerîyan, li Komara Kurdistanê xwedî derdiketin.
Hêza Pêşmerge, Alaya Kurdistanê, sirûda neteweyî Ey Reqîb, nirx û sembolên neteweyî, nîştimanî yên Komara Kurdistanê bûn. Zimanê Kudî zimanê fermî û zimanê perwerdeyê bû.
Komara Kurdistanê bi hişmendîya ku ji bo hemû hemwelatîyan ra bingehê sîstemeke hiqûqî, demokratîk ava bike, wek yekem dewleta Kurdan a bi şiklê komarî hatibû damezrandin.
Di dema îlan kirina xwe da, Komara Kurdistanê, li Rojhilata Navîn a ku di bin zordariya dewletên deshilatdar û dagirker da bû, bibû nimûneyeke azadî, demokrasî û nûjenîyê.
Belê Komara Kurdistanê destkeftin û serbilindîyeke hemû Kurd û Kurdistanîyên cîhanê bû.
Komara Kurdistanê ya ku bi Serkomarîya Pêşewa Qazî Mihemed hate îlan kirin, xwe wek Komareke Otonom pênase dikir, lê di eslê xwe da, bi hişmendîyeke neteweyî û niştimanî, bingehê dewletekê ava dikir.
Jiyan, helwest, şexsîyet, wasîyet û parastinnameya Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê, di eslê xwe de rêbaz û hişmendîya Kurdistanî û wazîfeyên me yên netewî û dîrokî pêşkêşî me dikin.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me ra dibêjin ''Li Alaya Kurdistanê xwedî derkevin; dibêjin hebûna miletê Kurd, hebûna Kurdistanê, parastina mafê çarenûsîya miletê Kurd bila bingeha sîyaseta we be''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me ra dibêjin, ''Dijmanatîya hev nekin, bi dijminan neyên xapandin; dibêjin hevkarî, yekbûn, tifaq, piştgirî, alîkarî bila ji nav we kêm nebin; dibêjin rêzê li xwîn û ked û xebat û têkoşîna hemû şehîd û dilsoz û kedkarên doza azadîya Kurdistanê bigirin''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê bangî hemû serok û rêvebirên Başûrê Kurdistanê û gelê me yê başûr dikin û dibêjin ''Ew nakokî, pirsgirêk û nexweşîyên xwe yên navxweyî deynin alîyekî; hemû dezgehên dewletbûnê yên leşkerî, aborî, îdarî, ewlekarî yên li Başûrê Kurdistanê bikin yek; bila azadî, demokrasî, edalet ji hişmendîya we kêm nebin.
Li himberî Bexdayê û hemû dewletên cîhanê yek deng bin; ji bo ku madeya 140î bê bicîhanîn destbidin hev', xebateke berfireh bimeşînin'.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê bangî 50 milyon Kurdên cîhanê dikin û dibêjin ''Wekî ku me bi xwîşk û birayên xwe yên ji her çar perçeyên Kurdistanê, li Mehabadê, Komara Kurdistanê îlan kir; hûn jî li destkeftîyên federe yên Herêma Kurdistanê xwedî derkevin; rêze li hikumranîya Parlemento, Hikûmet, Serokatî û Hêza Pêşmergeyên Başûrê Kurdistanê bigirin.
Li destkeftîyên li Rojavayê Kurdistanê hene xwedî derkevin''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me ra dibêjin ''Li Rojavayê Kurdistanê Mitabaqata Dihokê pêk bînin, îdareyeke hevbeş ya eskerî, sîyasî, aborî , dîplomatîk damezrînin. Rêya statuyeke sîyasî, milî ya li ser erdnîgarîya Rojavayê Kurdistanê bi tifaqa nevxweyî xurt bikin; dibêjin, azadî, demokrasî û edaletê ji xwe ra bikin rêbaz, bi kiryarên totalîterî, nebin wek wan dewletên ku Kurdistan dagir kirine''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me ra dibêjin ''Li Rojhilatê Kurdistanê yekgirtin, tifaq û raperîna gelê me ya piştî qetil kirina keça Kurd Jîna Emînî, dikare wekî sala 1946an rêya firsendeke dîrokî bîne ber derîyê gelê me. Bi tifaqeke xurt, berfireh ya neteweyî, nîştimanî, bi sîyaseteke ku hûn li Îranê û li cîhanê dijminên xwe kêm, dostên xwe zêde bikin, hûn dikarin pêşewazîya vê firsendê bikin.
Û ez hêvî dikim û bawerim ku, bi xebat û hevgirtina we, di demeke ne dûr da, vê carê ew Alaya pîroz dê ji Meydana Çarçira ya azad ve neyê xwarê''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me ra dibêjin ''Divê li Bakurê Kurdistanê hûn bîr û bawerî û hişmendîya Kurdistanî xurt bikin, li zimanê kurdî xwedî derkevin''. Dibêjin ''Yên dikarin bibin yek bila bibin yek; yên nikaribin bibin yek bila hevkarî û tifaqan li ser nirxên netewî û Kurdistanî pêk bînin; yên nikarin hevkarîyan bikin bila di nav dîyalogê da bin; yên nikarin di nav dîyalogê da jî bin, bila dijminatîya hev nekin''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me ra dibêjin, ''Li Bakurê Kurdistanê îro hûn çi mafên xwe yên milî bikaribin bidestbixin, ji wê derê destpê bikin, bêyî ku hûn armanca xwe ji bîr bikin, ji bo her mafekî xwe bixebitin. Bidestxistina her mafekî biçûk ê neteweyî, dê rêya azadî û serxwebûnê xweştir bike''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me ra dibêjin ''Li dîasporayê, li ser hişmendîyeke neteweyî, nîştimanî dest bidin hev; dezgehên bi yek armancê hatine damezrandin, yên wek hev, nêzî hev bikin yek; yên nikaribin bibin yek, bi hevdu ra bixebitin; dîplomasîyeke xurt bimeşînin; li dîasporayê li ziman, kultur, dîrok û nirxên xwe yên neteweyî xwedî derkevin''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me ra dibêjin, ''Îro şerdên Kongreyeke Neteweyî tune be jî, hûn dikarin di navbera her çar perçeyên Kurdistanê û kurdên dîasporayê da, Navendeke Koordînasyonê li dar bixin da ku hûn bibin alîkar, piştgir, hevalbendên hev û hûn zerarê nedin hevdu''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji serok, rêveber û endamên hemû partîyan ra dibêjin ''Ne serokatîya we, ne rêveberatîya we, ne navê partîyên we ji doza azadîya Kurdistanê,

»»»Dom R:4

»»»Doma R:3

ji xwîna şehîdên Kurdistanê, ji keda têkoşer û xebatkarên doza Kurdistanê ne bi qîmettir e, ne pîroztir e''.

Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê ji me hemûyan re dibêjin ''Bixebitin, fêr bibin, bixwînin, têbikoşin, di nava gelê xwe da bin, bi gelê xwe re bin, gêncên xwe, jinan, hemû civata xwe bi rêxistin bikin. Bibin partî û rêxisinên girseyî, netewî. Bîr û doz û bernameyên xwe bi gelê xwe bidin qebûl kirin''.
Belê, têgihîştina wasîyet û rêbaza Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê, herweha rê lêvekirina azadîya Kurdistanê ye.

Gava ku em li gorî wasîyet û rêbaza Pêşewa Qazî Mihemed û tecrubeya Komara Kurdistanê tevbigerin û ji tecrubeya wan dersên pêwîst derbixin û li gorî wê tevbigerin, dê ruhê Pêşewa Qazî Mihemed û yê hemû şehîd û kedkarên doza azadîya Kurdistanê şad bin.

Em Pêşewa Qazî Mihemed û hemû şehîdên Kurdistanê bi giramî bibîrtînin.

Mustafa Ozçelîk
Serokê Giştî yê PAKê

# Altirnatîf bo şoreşa Îranê divê çawan çê be

## N: Jêhat

Ev serê pitir ji 4 mehane ku şoreşeke seranserî bi dijî dîktatoriya Îslamiya Îranê dest pê kiriye, bi berewajiyê hemî carên derbasbûyî, vê carê hemî qat û texên seranserî yên Îranê û hemî Ol û Netewe û cudahiyên Îranê de, ev şoreş bi awayeke yekgirtî û yek deng bi dijî dîktatoriya wilayeta Feqîh dest dane hev û yekîtî û yekrêziya vê carê bûye sedem ku hem rejîma Îslamî seh bi sernixûniya xwe dike, hem ev yekrêziya bûye sedemê rakêşana piştewaniya berfireh a navdewletî û hem hêz û aliyên siyasî yên dijberên rejîmê seh bi yekrêzî û hevdengiya xwe kirine.

Ez dixwazim di vê nivisê de li ser xala herî dawî anku hewcehiya yekrêziya opozîsyonê rawestim û aliyên cuda yên vê mijarê, bixim ber çavên we xwînerên hêja.

Altirnatîf anku deshilata piştî nemana rejîma Wilayeta Feqîh, mijareke ku ev heyama 4 mehan e bûye basa nav hêz û aliyên siyasî yên dijberên rejîmê, û hem xelkê yekgirtî û yêkdeng ên navxweyî welat benda çêbûna altirnatîfekê ji aliyê opozîsyonê ve ne, hem jî ev hêz, sazî û welatên ku piştgîriya şoreşa xelkê Îranê bi dijî rejîma Îslamî dikin bendê ne, herweke xelkê navxweyî Îranê û opozîsyon jî yekgirtî be daku ev jî bizanin dê digel çi aliyekê bikevin danûstandinê û alîkariyê.

Herweke hemî aliyek haydar e, Îran welateke fire reng, fire kultûr, fire Ol, fire netewe ye û xelkê navxweyê welat bi hebûna wan cudahiyan dest dane destê hev û şoreş kirine da ku belkî piştî nemana rejîma Îslamî, hemî ev aliyên cuda bikarbin bigihîjin bi maf û azadiyên xwe ku di heyama deshilata 2 dîktaroriyên Paşayetî û Îslamî de hemî mafeke wan li jêr navê yek Milet, yek Ala, yek Xak, yek Omet, yek ziman û yek çand de, mafê wan jê hatiye zevtkirin.

Xelkê Îranê bi hemî cudahiyên xwe ve, hest bi vê yekê kirine ku Îrana piştî nemana rejîma Îslamî, divê Îrana hemiyan be, divê hemî xwediyê mafê wekhev bin, sîstema hikûmeta dahatî divê hemî cudahiyan bibîne, divê sîstema birêveberiya giştî ya welat ji aliyê hemî cudahiyan ve bê îdare kirin, nabe ku carek din welatiyên pile yek û pile dû û sê hebin.

Bitaybetî Îran pêkhatiye ji çendîn neteweyên cuda yên wek: Kurd, Belûç, Ereb, Tirkemen, Turkên Azerî, Fars û gelek etnîkên din, ku ev neteweyên han ji bilî Farsan çi yek xwediyê mafê neteweyî yê xwe nebûne, belkî ziman, çand, dîrok, xaka wan ji aliyê hikûmetên navendî ve hatiye înkar kirin.

Îzina îdarekirin û birêveberiya navçên wan, bi wan nehatiye dan, xaka wan hertim weke xakeke dagîrkirî hatiye dîtin, ziman û nasnameya wan qedexe bûye, baskirin ji çand û dîroka wan netewan tawan bûye.

Îro hemî ev neteweyên han bi dijî dîktatoriyê serî hildane, li serîde bona bi destveanîna maf û serweriya neteweyî ye.




Bi berçavgirtina wan rastiyan divê hemî hêzên opozisyonê li devra pilatformekê kom bibin ku wan rastiyan qebûl bike.

Xêncî totalîteriya rejîma Îslamî li warê civakî û sinfî û Olî û .... hwd, rejîma Îslamiya Wilayeta Feqîh jî wekî rejîma berî xwe a Paşayetî, ti cudahiyek di nav Îranê de nedît û heçî deshilatek li navenda Îranê de qorix kir.

Niha ku pitir ji %70 xelkê Îranê xeyrî Fars in û ji neteweyên Kurd, Belûç, Turkên Azerî, Tirkrmen, Ereb û yên din in, û bi awayeke herî radîkal pêşengê wê şoreşê ne, asta hişyariya wan ji bona zevtkirina mafê xwe biqasî çûye serwe ku bê guma ewqas hêz hene ku bikarin peyama xwe bigihînin bi opozisyona derweyî welat ku ti hêz û aliyek êdî wir şûda nikare hilgirê wê xevn û xeyalê be ku careke din hemî deshilatê li navenda Îranê de di destê kite dîktatoreke îdolojîk an malbat û neteweyekê de qorix û zevt bike.

Hemî neteweyên Îranê cehdê dikin ku bighîjin bi maf û azadiya netewey ya xwe û her hemî jî xwediyê hêz û aliyên siyasî yên pêşeng ên xwe ne ku ev hêz nûneratiya xebata wan ya netewî dikin, lewma ti hêzeke opozisyona seranserî bi tenê nikare bibe altirnatîf, meger ya ku bi awayekê demokratîk û sikolar îtirafê bi mafê hemî netewan bike û hakimiyeta dahatî ya Îranê bi beşdariya nûnerên wan netewan îdare bike û deshilata birêveberî û hemî mafê neteweyên cuda cuda bê dabîn kirin.

Ev hizr û teoriya pêşniyar û mijara herî bi cihe ku bikare wan netewan razî bike, hekî ne Îrana yekparçe ku dilê parek ji opozisyonê jêre lêdide, aliyê kêm dê bibe 6 parçe.

Renge ev dabînkirina mafê çarenivîsiya neteweyên Îranê li Îraneke demokrat û federal de, aliyê herî kêm mafê wan netewan be, û dikare wan aliyan jî ji nigeraniya perçe bûna Îranê bi 6 welatan, ji nigeraniyê der bixe.

Heçî aliyeke siyasî û opozisyon, hekî niha jî negihîştibe wê qinaetê ku Îran dibe ya hemî Îraniyan be, bêguman di fikr û mejiyê xwe de ji herdû dîktatoriyan xirabtir û dîktatortir e û bi destê xwe neteweyên bê maf yên Îranê pal dide ku xwe amade bikin bo şereke giran digel navendgeran, an bo heta hetayî tiştek bi navê welatê Îranê li ser xerîta cîhanê namîne.

Tenê serkevtina şoreşa JÎNa yê bi ser dîktatoriya Îslamî de, yekîtî û yekrêziya opozisyonê û hevdû qebûl kirine.

# Dr. Aso Hesenzade : “pêkhateya altirnatîf hem hiwên û hem jî bingeha pêkanîna altirnatîfê ye”



Dr: Aso Hesenzade \ Mamosteyê zanîngehê

**Me digel rêzdar Dr. Aso Hesenzade mamosteyê zanîngehê, li derheq altirnatîfa Îranê hevpeyvîn pêk anî navbirî got: “pêkhateya altirnatîf hem hiwên û hem jî bingeha pêkanîna altirnatîfê ye”**

**P: Rêzdar Dr. Aso Hesenzade hûn bigiştî pêkhateya altirnatîf çawan dinixrnîin?**

**B:** Berî vê ku em ji xwe pirs bikin pêkhateya altirnatîêf çawan dibe, dibe em jixwe pirs bikin ku pêkhateya altirnatîf çawan dibe, pêkhateya altirnatîf hem hiwên û hem jî bingeha pêkanîna altirnatîfê ye, hem di heqîqetê de berhemanîna encama altirnatîfê ye. Eger me di welateke demokratîk de bijiyana,

Altirnatîfa siyasî û hikûmetî bi rêya lîstika demokratîk a wan hêzan ve dihat dest nîşankirin ku bi awayê yasayî di meydanê de çalak û di halê rikeberiyê de ne. Vî demî taybetmendiyên destûrî yên xwediyê rewatî bi biryareke yasayî piştgirêdan bi rêkevtina berê ya hişmediya nûnerên alî û pêkhateyên cuda yên welat di hibijartineke giştî de çi bo parlemen û çi bo encûmeke destûrî dihat gazî kirin û berhemên rêkevtinê an heta rêkevtineke bijardeyan diixst halê deng dana giştî de. Dema ku em bas ji altirnatîfê bo rejîmeke beredayî dikin ku derfeta çalakiyên azad yên Hizb û aliyan û hilbjartinên demokratîk û tendrust nade û hemû ev hêzên ku daxwazkarê guherîna rejîmê ne li derveyî welat in an li navxweyî welat bi nehênî xebat dikin, mijar gelek dijwartir û aloztir e.

**P: Dr. Komek kesayetiyên siyasî yên Îranî bas ji vê yekê dikin ku, Hizb nabe di pêkhateya altirnatîfê de hûn vê mijarê çawa dinirxînin?**

**B:** Ev dîtingeha armancadar e, bi tevahî bê bingeh û zirarê digihîne. Yên ku xwediyê pêşniyarên wiha ne, ev bixwe xwediyê ti cure pêgeheke cemawerî û rêkxiravî nin û dizanin jî ku ev Hizb û rêkxiravên opozisyona Îranê ku bernameya zelal û derbasbûyî xuya di xebat û tekoşînê de hene û di şoreşa vê carê ya xelkê de jî li dijî rejîmê rola girînga meydanî dilîsin, bitaybet li Kurdistanê bo koma armancên gelekê xebat dikin ku wan digel bicih bidestvehatina wan pirgirêk hene.

**P: Dr. Partiyên Rojhilatê Kurdistanê di çêkirina altirnatîfê de bo Îranê çi rolek hene? Glo heta niha pêka hewce ti karek jêra encam dane?**

**B:** Digel vê ku bi kêfxweşî ve partiyên Rojhilat (aliyên ku xwediyê derbasî ne) bitaybet di çarçêveya Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê de, asteke baş di yekgirtinê de û hevahengîkirin a siyasî ji xwe nîşan dane û di vê heyamê de jî weke cemsereke girîng û bandordar a geşedan bi siyasetên niha û paşeroja Îranê derkevtine, lê hîn hewce ye ku zêdetir li ser rêkxistina hêz, şiyan, gotar, dîtingeha, û keresteyên xwe di hemû aliyên xebatê de kar bikin da ku weke yek ji wan bo danûstandinkirin digel opozisyona Îranê û çêkirina altirnatîfeke siyasî.
Wan Hizbên çi di navxwe de û çi di pêwenddî digel opozisyona Îranê de gelek zêde kar kirine û aliyê kêm di pêk anîna sê hevpeymaniyên di nav opozisyona Îranê de rola çalak û yek alîkirinê lîstine. Lê, bi liberçavgirtina rewşa hestyar a niha ku dîmenên herfîna Komara Îslamî nêzîktir dike û herwisa ji ber vê ku dîgehngeha zêdexwazan e û navendgerayane di nav opozisyona Îranê de dijwartir û êrîşberantir ji berê, digel bi encam gihandina mafên neteweyî yên gelên bindest yên Îranê dijberiyê dikin hewceye ku hewlên bilokên Kurdî li îranê (ku xuyaye bixwe jî hewcehî bi berfirehbûn û xwe bihêztir kirinê heye) digel wan hêz û aliyên Îranî yên ku şiyana fêmkirin û erê kirina daxwazkariyên wan neteweyên bin dest ku hene çirtir bikin.

Hewceye desthilatdariya siyasî an yek ji desthiladariyên siyasî yên sereke yên wan bo paşeroja Îranê hêzên Kurdî bin yên ku destê wan bi navendên giraniya şoreşa Jînayê girêdayî ne û di meydanê de dijmin tengav kirine, nek ev pêkhate û wehm û kesayetyên zêdexwaz yên ku hewl didin bi rêya twîter û yekdestiya medyayî ve li ser xelkê de bên sepandin.

**P: Dr. Li berçavgirtina Îrana firerehendî ku ji çendîn netewe û etnîkan pêk hatiye, çi bandorek li ser paşeroja Îranê heye?**

**B:** Yekemîn bandora di berçavgirtinekê de, ragirtina neteweyên zilim lêkirî yên Îranê ji bindestî û zilm û cudahîdanînê dibe, hemû ev pirsigirêk û arîşeyan di rûbereke wiha de li warê geşekirin, girêdayî û aramiyê de bo paşeroja wan û hemû Îranê diafirîne. Xuya ye bi liberçavgirtina asta hişyariya siyasî û rêkxiraviya wan neteweyan û rola girîng a peravêzkiriyan di şoreşa vê carê ya xelkê Îranê de, ez bi dûr dizanim ku desthilat paşerojê hewla nedîtina peravêzragirtin û zoedestiya wan neteweyan û aliyê kêm bi hêsanî ji bo wan here ser.

Bandora duyem, di hewlek wiha de, xisar gihandin bi koma piroseya siyasî û pirsa demokratîzasyona Îranê ye, çimkû bi dirêjahiya sedsalên borî ya destihlata navenda bihêz, bi bingeha hizrî û êdolojîk û zêdexwazane ya weke take amûra li ser hev ragirtina firerehendî, haşalêkerên di nav cografiya Îranê de hatiye temaşe kirin. Ev desthilat jî ji ber vê ku wek li Firansayê berhema piroseyeke sirûştî û dîrokî nebûye an wek li Hindostanê nehatiye hûr kirin, beredayî û drindeyî jî hatiye gorê û her cure daxwaziyeke azadîxwazane û demokratîk di navend û beşên din yên Îranê de serkut kiriye. Demaku wiha bû nedîtina mafê neteweyên din li Îranê de, bi wateya dirêje dan û berhem anîna dîktatoriyê bo hemû Îranê ye jî.

**P: Gelo hevpeymaniyek dibe bi bê amadebûna netewe û nûnerên wan li Îranê serkevtî be?**

**B:** Bi li berçavgirtina zalbûna dîtingeha dîrokî ya zêdexwazî û navendgerayî li opozisyona Îranê de, vê yekê dûr nabînim ku di heyama mehên bê de, şahidî ji hev nêzbûna hinek cemseran di nav opozisyonê de bin ku berê heta amade nebûn bi hevre biaxivin jî. Hevpeymaniyeke bi vî awayî ku eger di kurt demê de jî be bikare manhorê bide bi qezenca merema zêdexwazane û navendgerayane ya xwe fezasazî bike, di dem dirêj de serkevtî nabe û eger Komara Îslamî desthilatê jî bigire bi dest, nikare dereqeta çareserkirina pirsgirêkên firerehendî yên Îrana paşerojê derbikeve, çimku taybetmendiyek gelek girîng a serdema niha di Rojhilata Navîn û bitaybet li şoreşa vê carê ya xelkê Îranê eve ku yêku biryarder e heqîqeta meydanê ye nek axavitina siyasî û xelk bi pêgîrane û bi sistî daxwaz û dîtingehên wan şirove dikin û êdî razî nin ku carek din wikaleta wî karî bo hertimî hişmendiyeke siyasî bidinê. Herçawan ku me li jorê jî qala vê yekê kir, parçên neteweyên bindest yên Îranê li ser hev vê xiştеya siyasî de li demên berê gelek zeqtir û bandordartir dibe.

**P: Dr. Aso Hesenzade bi dîtingeha we baştirîn hevpeymaniyek ku di Îranê de dikare bê gorê, çi hevpeymaniyeke?**

**B:** Her demaku hemû xelkê

»»»Dom R:6

»»»Doma R:5

welatekê di kirîza mezin a nîştiman de derbas dibin, rûbirûyê şer û destdirêjiyên derve dibin an bo herfandina rejîmeke dîktator xebat bikin, ya baş eve ye ku, pêkhate, hêz û aliyên dîtingeh potansyela xwe di çarçêveya platformeke hevpar de rêk bixin.

Îrana niha jî di heman rewşê de ye. Lê, şikesta proseya dewlet û netewe di Îranê de û ev mevda û veqetiyana siyasî û dîrokî û hizrî ye ku civaka siyasî û opozizyona Îranê heta niha bidestê vê dinalin hemû wisa dikin ku niha zemîneya çêbûna platformeke wiha hemû alî li gore de nebe.

Dema ku koma hêz û hestyarên di nav civaka siyasî ya Îranê de nikarin her niha li ser platformeke hevpar rêk bikevin ku, hem bingehên demokrasî, sikolarîzm, mafê mirovî û mafê hevwelatîbûn, û hem bifermî naskirina hêz û pêkhateyên civaka Îranê bitaybet neteweyên wî welatî û beşdariya dadperwerane ya wan di birêvebirina welat de, û hem forma dewlet û sîstema hikûmetî ya dilxwaz bo Îranê (ji bo mînak sîstemeke federalî, komarî/parlemanî) ji xwe bigire, renge bi dîtina heqîqî, wisa be ku berê wan hêz û aliyan zêdetirîn nêzîkbûn û aliyê rêkevtinê bihevre hene, ku di çarçêveya du an sê cemserên siyasî de yekbigrin, piştire wan cemseran bihevre gotûbêjan bikin ji bo vê ku li ser aliyê kêmek li pirensîp û armancan heta herifandina rejîmê bo qonaxa veguhastinê rêkbikevin. Û Piştire eger berhema vê rêkevtinê gihîştin bi lihevkirineke nîştimanî nebû, hewl bidin ji rêya demokratîk ve berdewamiyê bi rikeberiyên siyasî yên xwe bidin.

## Çarşema sor di meha Nîsanê(Avrêl) de ye.Nisan bûka salê ye

### N: Kofîxwar

Çarşema sor di ola Ezdatîyê de yek serê sala Kurdan e.Îdeka pîroz,giringtirîn îda kurdan, îda bawermendên Êzdatiyê herweha mezinitrîn pîrozbayî ye.
Ev roj Çarşema ku dikeve hefteyê 13ê Nisanê an jî ji pey wê rojê, li pey rojvegera biharê wek roja vejîna jîyanê ye. Laleş jî cihê vê pîrozbahiyê ye. Li gor baweriya Êzîdiyê vê Çarşemê çêbûna dinê bi Melekê Tawûs û arîqariya firişteyên din ve diqede. Piştre bi ax û ava dinê dîsa li Laleşê însan tê afirandin û bi vî awayî jîyan destpê dike.

Tê bawerkirin ku beriya çêbûna dinê ango beriya vê rojê seranserê dinê giş av bûye. Xweda bona çêkirina jêrzemînê firişteyên xwe di gel meya erdê dişîne daku erd bê çêkirin, jiyan dest pê bike.Firiştê sereke Melekê Tawûs hawirdora dinê digere tu cihekî qenc nabîne heta ku tê Laleşê. Îca li vir biryara meyandinê dide. Li vê derê meyayê avê dixe, av dimeyê,erd çêdibe. Pêşîyê Lalêş derdikeve ji ber vê Laleş wek navenda dinê tê pêjirandin. Lewma Laleş mezintirîn cihê pîroz e. Xeynî vê Laleş cihê gora Şeyh Adî ye. Çarşema sor di meha Nîsanê(Avrêl) de ye. Nisan bûka salê ye. Xweza di vê mehê de wek bûkekê her xwe dixemilîne. Ewqasî dixemile ji wê rindtir tu bûk nîn in. Ji ber vê di vê mehê de hîç dawet çênabin.

Daweta mezin ya xwezayê ye. Dinya nû çêbûye, her tişt dimeyê, tovên cûr bi cûr şîn dibin. Jê pê ve çandinî, cot nayên kirin, ax tevlîhev nabe. Roja daketina Melekê Tawûs e. Melekê Tawûs yek jî bona ji holê rakirina xerabî, nerindî û nebaşiyê, di dilê mirovan de şînkirina başî, qenciyê û xweşiyê tê. Melekê Tawûs nîşaneya dilpakî, qencî, başiyê ye .
Rêûresmên Çarşema Sor.
Rojek beriya Çarşema Sor ango roja Sêşemî hêq rengoreng têne boyaxkirin. Rengo reng kulîlk tên berhev kirin, nemaze kulîlka sersork(gulebûk) ku nişaneya xweşbînî û şabûnêyê ye. Paşê kulîlkên berhevkirî li ser deriyên malan dadiliqînin. Yên ku heywanan xweyî dikin wê rojê pez û dewarên xwe nadoşin, beriya roja îdê mastên ku çêkirine li ciranên xwe belav dikin. Xwîn nayê rijandin.Tu heywanan serjê nakin.
Hêq tên kelandin û boyaxkirin ku hêq sembola dinê sembola afirandinê ye. Jê pê ve mînaka hemû zindeweran e.Wek beriya meyandina erdê hundurê hêqê jî tije av e; zerik ax û erd e û spiya wê av e.Kelandin, sarkirin, boyaxkirin û şkestina hêqan di heman demê nişaneyên çhar pirtikên gerdûnê(agir, av, hewa, ax) ne.Boyaxkirina hêqan her rengê cîhanê nîşan dike.Lê taybet di nav de çhar reng teqez hene;kesk,sor,zer û spî.Kesk,her hebûnên li ser Dinê ango nebatan,ax,çiya û baniyan.Sor jîyanê.
Zer tavê.Spî avê û ronahiyê nişan dike.Ev çhar reng herweha rengên ala pîroz in .Lewma kurd jîn in,hebûnên kurdan xwezayî ne.Bi kelandina hêqan ve çêbûna dinê careke din nîşan dikin,pîroz dikin.Heq dikele ,dinê dimeyê.
Di malekê de ji bo her kesekî hêqeq tê kelandin û boyaxkirin. Bi her kesekî ve çêbûna dinê ji nû bi bîr tînin. Bi qaşikên hêqan ve hêvîrên çêkirî li ser deriyên malan dizeliqînin. Heke heta Salekê hevir nekeve wê gavê daxwazên wan dê bi cî bên. Xeynî wê bendên kesk, sor, zer û spî zendên xwe dialînin û sê giran girê didin. Heke gir xwe bi xwe vebe daxwazên wan ê bi cî bê. Xwarinên cûr bi cûr, kilor tên çêkirin. Roja Çarşemê jî li wan xwarin û mêweyên hişk bi xwe re dibin li ser goristanê.

**Roja Çarşema Sor Li Laleşê**

**Laleş parêzgeha pîroz e.** Di geliyekî de ye. Laleş li nav sînorê Başûrê Kurdistanê 10 km ji dûrî Duhokê li navçeya Şêxanê ye.
Cihê hecê Êzîdiyan, ciyê kaniya spî ango Kaniya pîroz ku Kurdên Êzîdî zarokên xwe tê de mor dikin e.Vê gavê her dewlet, her hêzên çekdarî dixwazin li ser Şengalê serwer bibin, Laleşê ji Şengalê herweha Kurdan ji hev biqetînin. Lê Şengal,Laleş,Girê Spî, Efrîn,Kaniya Spî û hwd warên kurdan,Êzîdiyan in.
Roja Çarşemê serê sibê jin û mêr, zar û zêç berê didine cihên riwekan; karî û kulîlkên sersorkê û yên din ên rengoreng berhev dikin.
Jinên malê hêqên kesk, sor, zer, binevş bi kiloran ve belavî xizanên derûdorên xwe dikin.
Hin kes qaşikên hêqan bona zêdebûna zadên çandinî davêjin li nav zeviyan. Qaşikên hêqan zêdeyî û qenciyê sembolîze dike.
Xelk bi pêşengatiya şêxan û civata oldaran li Lalêşê tên ba hev. Bi lêdana defê bi xwendina risteyên dînî ve îd destpê dike...

Bona ku ji guneyên xwe rizgar bibin li deriyê pira Enzelê maçî dikin bi lawayên zaravê kurmancî sê caran (fitlan) li dorê davêjin û derbasî li hundurî Parêzgeha Nuranî dibin. Bi lingên pêxas dikevin li hundurê parêzgehê li dora kêranan pirtiyên rengoreng dipêçin û sê caran giran çe dikin û vedikin bi vî awayî niyazên xwe lawayên dikin. Bi ava kaniya Spî sê caran dest û rûyê xwe dişon û derbasî zîyareta avê zimzimê dikin.
Diçin Seredana goristanan. Pêşiyê ya Şêx Adî paşê yên şexên din û seredana hemû goran dikin. Bi dorê diçin destên Baba Şêx.
Di Laleşê de 366 nişangehên xasa hene. Her dem li ber deriyê her nişangehê fîndek tê gurrî kirin. Roja Çarşema sor ji bo her rojên salê 366 fînd(çira) tên vêxistin, gurrî kirin. Vêxistina fîndan pîrozkirina serê salê, destpêka biharê, vejîna cîhanê ye.
Xweyiyê goran li ser gorên xwe zadên ku anîne datînin, vexendî xelkê dikin. Ji bo xêra miriyên xwe zadan belav dikin û didine xwarinê. Mebest ev e ku miriyên wan dinya din ji xwarinan bêpar nemînin; çavên wan tu carî di xwarinên din de nemînin.
Li ser goran jî defê lê dixin risteyên dînî dixwinin. Ji pey lawa kirinan qismek xwarinên xwe datînin li ser goristanên xweyiyên xwe da ku yên ku hatine seredana goristanan bona xêra miriyan bixwin. Xwarin û zadeyên mayî jî cihekî hevpar nîşan dikin û li wir sifreyeka mezin ava dikin li ser wê bi hev re dixwin. Endamên malbatan, heval û hogiran heqên rengo reng li hev dixin dişkênin bi vî hawî dileyîzin.

## Nerîna Lîderan



**“Siyamend Haco:”**

Asayîkirina pêwendiyên Enqere û Şamê bi hilbijartinên Tirkiyê ve girêdayî ye



**“Ned Price”:**

Îran hewl dide ji valahiyê sûd werbigre.



**“Michael Erik Kurilla”:**

DAIŞ hîn jî li ser asayîşa navçeyê gef e.



**“Benyamîn Netanyahu”:**

Îran aloziyan vediguhezîne welatên din

# Li Yekîtiya Ewropa tevgerên li dijî Tehranê bihêz dibin!



**N: Eskender Ceiferî**

Piştî ku jina Kurd bi navê Jîna Emînî di nîva Îlona 2022’an de li Tehranê ji aliyê polîsên rejîma faşîst a Tehranê ve hat kuştin, xwepêşandanên li dijî rejîmê li Kurdistanê dest pê kirin û pişt re li herêmên din ên Îranê belav bûn.

Ev têkoşîn, niha bi navê Jin Jiyan Azadî tê binavkirin. Ji wê demê ve her roj vîdyo, wêne û raporên Îranê ji Îranê derdikevin ku siyaseta baviksalarî ya rejîmê nîşanî me didin. Ger di bin desthilatdariyeke wiha faşîst de rewşa jinan biguhere, wê bandorê li ser rewşa jinên li welatên din ên Rojhilata Navîn ên weke Iraq û Afganîstanê jî bike. Vê têkoşînê heya niha kariye ji çend aliyên cîhana rojava destekê werbigire, lê ev têr nake. Ew xelk ji bo azadiya jinên cîhanê têdikoşe. Niha jinên li Kurdistanê û herêmên din ên Îranê nûnerên jinan welatên din ên Rojhilata Navîn in.

Jin di vê têkoşînê de bi tenê nîn in. Di vê têkoşîna mezin de ji bilî jin û zilaman, homoseksuel, LGBT û kêmîneyên din jî cih digirin. Ev yekemîn şoreşa jinan a cîhanê ye ku li Kurdistanê dest pê kiriye û pêwîste li hemû cîhanê bê îxrackirin.

Rojnameya Lîberation a çapa Parîsê jî roja 2’ê meha 2’ê ya 2023’an di raportekê de eşkere kir ku şaredariyê, biryar standiye ku wêneyê Xumeynî avakerê rejîma gemar a faşîstên Tehranê rakin û li dewsawê, wêneyek ji serhildana Jîna danîne wir.

Di rojên derbasûyî de jî Annalena Baerbock wezîra derve ya Almanya ragihandibû ku em dîsa li Îranê riftara hovane ya rjîmê li hemberî xelkê wan dbînin. Sipaha Pasdaran ya rejîmê her roj xelkê têror dike. Lewma niha pir girîng e ku em pêleke din ya dorpêçan bixin ser rejîmê û bi taybetî ser Sipaha Pasdaran. Dîsa em bi awayekî eşkere dibêjn ku em li rex xelkê wêrek li Îranê disekinin û em têrorkirina welatiyên Îranê ji aliyê rejîmê ve şermezar dikin.

Beriya niha jî Komeleya Mafên Mirovên Kurdistanê li Genevê ji Neteweyên Yekbûyî dixwaze li dijî rejîma faşîstên Tehranê tevbigere. Parêzvanên Mafên Mirovan, Ensemble Contre la Peine de Mort, û Komeleya Mafên Mirovan a Kurdistanê-Genev piştgirîya avakirina şandeyeke navneteweyî ya serbixwe ya lêkolîna rastiyan li Îranê dikin.

Di daxuyaniya wan de hatiye: Ji dema ku xwepêşandanên li seranserî welat piştî şehîdkirina jina ciwan a Kurd Jîna Emînî dest pê kirin, desthilatdaran sedan şehîd hene ku beşeke zêde ji wan jin û zarok in.

Rayedaran bi hezaran kes ji ber ku tevlî xwepêşandanên aştiyane bûne binçav kirin. Wan bi kêmî ve şeş kesên ku bi xwenîşandanan re têkildar in, li ser bingeha sûcên nezelal ên şerê li dijî Xwedê an gendeliya li ser rûyê erdê, cezayê darvekirinê dane. Em ji ber bikaranîna hêzeke zêde ya desthilatdaran li dijî xwepêşanderan, bi taybetî li parêzgehên Belûçistan û Kurdistanê, gelekî nîgeran in. Em her wiha bi tundî windakirina bi zorê ya xwepêşanderên birîndar û kuştî û redkirina rayedaran ji dayîna cenazeyên kuştiyan ji malbatên wan re şermezar dikin.

Hêzên zordar ên Komara Îslamî li Tehranê jî êrîşî zanîngeha Şerîf kirin û çend demjimêran zanîngeh dorpêç kirin. Ew jî piştî protestoya xwendekaran û bi danîna kemînan ji bo xwendekarên dihat û tê de di encamê de hejmareke mezin ji xwendekaran hatin binçavkirin û ji wan xwendekaran jî li wir hatin birîndarkirin.

Tawaneke din a Komara Îslamî êrîşa li ser girtîgeha Êvîn a li Tehranê bû. “Êvîn” bi kiryarên dijmirovahî yên li dijî girtiyên siyasî û çalakvanên biyanî yên ku di zindanê de tên ragirtin navdar e. Tê gotin ku bi sedan welatiyên binçavkirî yên vê dawiyê jî li vê girtîgehê ne.

Di encama vê êrîşê bi dehan girtiyan jiyana xwe ji dest dan. Mafê jiyana azad, jiyaneke bi rûmet û hebûna mafên siyasî û civakî, beşeke bingehîn a mafên mirovan ên vê serdemê ye. Mafê ku ev 43 sal in ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve tê zewtkirin û ji gelên Îranê hatiye standin.

Niha ku em li vir kom bûne, piraniya bajar û deverên Îranê ji Kurdistanê heta Belûcistanê, ji Ehwazê heta Azerbaycanê, ji Gîlanê heya Tehranê, Îsfehan, Meşhed û bajarên din bi tundî ji aliyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê ve tên tepisandin û her kêlî em şehîdkirina kesekî ji aliyê rejîmê ve dibînin. Komara Îslamî hemû riyên têkilîdanîna bi mirovên derveyî Îranê re jî girtine. Niha gelek dijwar e ku bi bajar û navçeyên curbicur yên Îranê re têkilî çê bibe û Komara Îslamî ya Îranê bi qutkirina înternetê û rêyên din ên girêdana gel û çewisandina raperîna gelên Îranê hewl dide ferzkirina dîktatoriya xwe li ser gelên Îranê bidomîne.

Rejîmê di nava zêdetîrî 40 salên xwe de hem li hundir hem jî li derveyî welat xwe ji ti sûcî neparast. Di hundir de bi darvekirin, girtin û binçavkirina mirovan jiyana xwezayî, azad û bi rûmet ji gelên Îranê standine. Ev rejîm li derveyî Îranê her tim piştgiriya têrorê dike û bi rêxistinkirina komên tundrew bûye metirsiyeke mezin li ser ewlehiya welatan û aştiya cîhanî.

Dirûşma “Jin - Jiyan - Azadî” bûye sembola têkoşîna neteweyên Îranê û hemû çînên civakê li dijî wê desthilata dîktator û hemû netewe, kêmneteweyên netewî û olî yên Îranê ku Kurd, Fars, Tirk,

# Siyaseta dirust ya Kurdî



N: Ebdûlazîz Qasim

Piştî destpêkirina şoreşa #Jîna_Emînî, carek din hêviyên gelên Îranê bi giştî û gelê kurd bi taybetî ji bo siberojeke nû geş dibin, bi şewtandina rûpeleke reş ji dîrokeke pir stem û zordestî û nivîsandina rûpeleke nû ku têde gelê kurd bi mafên xwe yên neteweyî şad bibe.

Wekî me dît piştî serkeftina mezin ya gelê Kurd li ser rêxistina DAIŞ ya terorîst û encamdana referandoma serxwebûna Herêma Kurdistanê di 25'ê êlûna 2017'an de, ku çawa dagîrkerên Kurdistanê bi planên xwe ligel bêdengiya dewletên diniyayê bi taybetî bi glopa kesek ya Amerîka û Rûsiyayê kerkûk, Şingal, Efrîn, Girêspî û Serêkaniyê dagîr bikin?

Îrojî bi heman awayî dewletên dagîrker di hewl

Hikûmeta Bexda û herwisa rêjîma Sûriyê jî yan wê bijardeyek serbixwe dûr ji hejmongeriya rêjîma Îranê helbijêrin û yan jî dê çarenivîsa xwe bi rêjîma Îranê ve girêbidin, ew jî dê bibin hevparên heman çarenivîsa reş û nediyar, ku li dawiyê siyaseta aqimendî ya Hikûmeta Herêma Kurdistan û Partiya Demokrata Kurdistan-Îran serbikeve.



û bizavên berdewam de ne ji bo armancên xwe sereke yên li dijî gelê Kurd, lewra di van rojên dawiyê de dibînin ku ji aliyê Tehran û Bexdayê hin hewl dibin bo peydakirina nakokî û kirîzên ewlehî, siyasî û aborî bo Hikûmeta Herêma Kurdistanê herwiha bo Partiyên Rojhelatê Kurdistanê bi taybetî (Demokrata Kurdistan-Îran), ku rêjîma Îranê bi her awayekî dixebite ji bo derbaskirina krîza xwe li nav Herêma Kurdistanê, lê heta niha sernekeftî ye di pêkanîna vê yekê de bi saya siyaseta dirust û saxlim ya Hikûmeta Herêmê û Partiyên Rojhelatê Kurdistanê.

Berdewamiya Şoreşa #Jîna li ser hemû stem û serkutkariya rêjîma Tehranê, pêdagiriya gelê Îranê li ser rûxandina vê rêjîmê tekez dike, hevdem ligel sizayên navdewletî bi taybetî yên dewletên Rojava li ser rêjîmê yên roj bi roj zêdetir dibin, ku dûr nîne supaya Pasdaran jî bikeve di nav lîsta terorîzma navdewletî de, ku ev yek bi germî ketiye di rojeva Perlmana Yekîtiya Ewropî û Perlmanên çend dewletên Rojavayî de.

Barê aborî li Îranê têk diçe û bihayê Tomanê Îranê beramber Dolarê Amerîkî di şikestinek berdewam de ye û li gorî rojnameya "Îqtîsad Poya" ku eger hîç rêkeftin li ser pirsa atomî dirust nebe, dê aboriya Îranê têk biçe, ku heta niha hîç rêkeftin peyda nebûye û dibe peyda nebe nemaze ku tevî hewlên rêjîma Îranê bo çêkirina çekên atomî û firotina firokeyên bêfirokvan û mûşekên balîstîk bo Rûsyayê, lê êrîşa li şeva Şemiyê 28.01.2023ê li ser navendeke serbazî li Îsfehan, lawaziya sîstema bergirî û emnîyetî ya rêjîmê aşkera kir, zêdebarî zêdebûna krîza aborî ya rêjîma Îranê, ku li gorî çavkaniyekî agahdar ji Iran International re ragihandibû, ku Amerîka lêkolînê li ser raportan dike ku Îran û Iraq bi dolaran bazirganiya di nav xwe de dikin, ku li gorî sizayên Amerîkayê, her bazirganiyek di navbera Îran û Iraqê de divê bi dînarê Iraqî be û bikaranîna dolarê Amerîkî di van bazirganiya de qedexe ye, ku niha nirxê Dînarê Iraqî jî dikeve bi sedema piştgiriya darayî ya hikûmeta Bexdayê bo Tehranê, herwiha ku dibe aboriya Îraqê jî têk biçe û heta dûr nîne tûşî sizayên Amerîkî jî bibe, herger Hikûmeta Bexda bimîne li ser piştgiriya aboriya Îranê.

## Fermandeyekî leşkerî yê rejîma Îranê li nêzî sînorê Sûriyê û Îraqê hate kuştin

Li nêzî derdorê devera El-bûkemal çendîn kamiyonên hilgirê çekan kevtine ber êrîşa dironan û çendîn kes ji wan hatine kuştin ku yek ji wan fermandeyekî leşkerî yê rejîma Îranê bû.



Çavdêriya Mafê Mirovî li Sûriyê ragihandiye, sibêdeha roja Duşemî 10ê Rêbendanê, li gundê "El-herî" li nêz sînorê Sûriye-Îraqê li parêzgeha "Dêrezor"ê, çendîn kamiyopnê hilgirê çekên Spaha Pasdaran kevtine ber êrîşa dironan û renge ew êrîş ji aliyê hêzên Îsraîlê ve hatibe kirin.

Di vê êrîşê de 10 kes hatine kuştin ku yek ji wan fermandeyekî leşkerî yê rejîma Îranê ye ku heta belavbûna vê nûçeyê navê wî nehatiye zanîn; Çavdêriya Mafê Mirovî li Sûriyê ragihandiye ku tevahiya wan kuştiyan xelkê Sûriyê nebûne.

Pêka gotina wê saziyê, zêdetir ji 15 hezar milîs ji welatên Îraq, Efxanistan û Pakistanê ji aliyê rejîma Îranê ve perwerdeya leşkrî dîtine ku piraniya wan li parêzgeha Dêrezorê bi taybet li navbera bajarê Dêrezor û El-meyadîn"ê de cihgîr in ku hewcehiyên wan ji sînorî Îraqê ve bo wan têne şandin.

# Carekê ku em li hember tundûtîjiyê bêdeng bûn



N: Vênûs Fayîq
W: Hesen Mukerem

Sala 1979`an Neteweyên Yekbûyî rêkevtinnameyek bona jinavbirina hemû cureyên tundûtîjiyê pejrand ku piştire bi rêkevtinnameya (CEDAW) hat naskirin

. Pêka vê rêkevtinnameya ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hat pejrandin taybet nine bi civaka welatekê, belkû taybete bo hemû cureyên tundûtîjiyê li seranserê cîhanê, her welatek jî ku bixwaze ev yek hebe ku civaka vê ber bi pêşive here û demokrasî û lîbiralî weke sîstemê bo birêvebirina civakê pejrandibe û pêka vê bixebite, pê dixebetin û bendên vê pêyrew dikin û cî bi cî dikin.

Digel vê yekê jî, di seranserê cîhanê de kêm an zêde heye lê, cudahiya vê li serweriya yasa û cezadan bi encamderên curên tundûtîjiyê li dijî jinan e.

Li Rojhilat, bi taybet li civaka Kurdistana me de axavtin li derheq destkevtên wiha yên cîhanî û çendîn destkevtên din yên yasayê ku bo berjewendiyên jinên hatinî çewsandin hatiye danîn, di çarçêveya te`oriyê de dernakeve, bilî vê ku tenê neteweyên kêm ku bas ji vê yasayê dikin û daxwaza birê ve birina vê dikin, piraniya vê ku di bin bandora edet û sîstema eşîreyî de ne û bi taybet yên ku paşgirek ayînî hene, ev xwe ji axavtinên wiha dûr radigrin, çimkî bawerî bi vê yekê tunînin û li dijî ne.

Li sala 1981`an şûnda ev yasaya hundrî qonaxa birêvebirina salane ya li roja 25`ê Çiriya Pêşîn bû, ku bi navê salroja berxwedanî li hember tundûtîjiya li dijî jin û keçan her sal rêûresima vê lidar dixin e, roja ku behsa van sûcan tê kirin, çêtir e ku xwe ji atmosfera cejnê dûr bixin û çareseriyan pêşniyar bikin û ji bo guhertinê givaşan li sîstema hiqûqî û dadwerî bikin.

Dibe her sal bi şûna ku birêvebirina rêûresim û sing dana pêş û bazarên partiyan û hejmartina destkevtên vala, diyarî kirina demek rawestan bona rêz girtin ji canê pak yê qurbaniyan û li şûna vê ku berpirsatiya rewşên dijwar yên jinan bixin stûyê wê/î û alî û desthildaran tohmetbar bikin, rêkxirtavên taybetmend di wî warî de bi eşkereyî li ser xemsariyan biaxivin.

Û dezgehên pêwendîdar şikestên xwe erê bikin, dezgehên dadweriyê vê yekê erê bikin ku dezgeheke mêrsalar û dûr ji şerî`etê ti yasayek û ti nirxek tune ye.




Ez îtraf bi vê yekê dikim ku mezintirîn şaştiya ku heta niha em pêra meşiyane eve ku, me bi qasî kûştina jinê piçûk kiriye ku me navê vê kiriye "Kuştina bi hinceta şerefê", di halekê de kuştina jinê tawaneke ku gelek ji vê mezintir e, tawaneke li derheq tewahiya mirovahiyê, bi navkirina (kuştin bi hinceta şerefê) di pileya yekem de tenê naşîrînkirina jinê ye, piştire anîna ayînê weke hincetê bo vê ku encamderên vê jê rizgar bibin.

Her hemû cureyên tundûtîjiyên li dijî jin û keçan bixwe di xala berevanîkirin ji tiştekê de cih digirin ku jêra dibêjin "Şeref", di halekê de tiştek bi navê "Şeref" hebûna vê tune ye, yaku heye zayendeke bo vê ku desthilata xwe ji dest nede û zayenda din kontrol bike, têgehek pêk aniye bi navê"Şeref" bo vê ku zayenda din pê lixav bike û bixe di bin kontrola xwe de.

Yaku haşa jê nayê kirin eve ku, tundûtîjiya li dijî jinê naşîrîntirîn cureyên binpêkirina mafê mirovan e, ji hemû cureyên din yên tawanan berfirehtirîn û tirsnaktirîn e, çimkî tawaneke bi piştgîriya edet û ayînê tê encam dan û gelek kêm encamderek digihînin bi cezayê kêrhatî yê xwe.

Di dawiyê de, beşek ji vê jin bixwe dibe hewl bide, çimkî yekemcar bêdeng bûn di sivikatiyê de, yekem car erê kirina lêxistinê, wisa ji zilam dike ku heta bikare lêbixe û sivikatiyê bi jinê bike.

Û dema ku jinê bo yekem car jî dengê xwe nekir û negot "bese" û yekem car jî serî ranekir, wisa ji zilam dike ku di îşkencekirin û sivikatîkirina jinê de berdewam be.

Her yek ji me di cihê xwe de berpirsayetî bi stûyê wî\ê ye bo guhertina rewşa jinên ku bi destê zilamekî tundûtîj hatine çewsandin.

Eger em çalakvanê dezgehekê bin ku berevanî ji mirovbûna jinê dike.

# Kamêran: Jinek bi gulleyan ji aliyê hevjînê berê yê xwe ve hat kuştin



Roja Sêşemî 11`ê Rêbendanê, demjmêr 11:00 paşnîvro, jina ciwan a bi navê "Rizwan Nedîmî" û keça Mehmûd a xelkê gundê "Zîviye" yê ser bi bajarê Kamêranê bi teqeya gulleyan ji aliyê hevjînê xwe ve hat kuştin.

Pêka gotina çavkaniyeke haydar, Adil Ferecêlahî, hevjînê berê yê Rizwanê, du salan berî niha ji Rizwana hevjîna xwe cuda bûye.
Herwisa wê çavkaniya haydar ev yek jî zêde kiriye ku, Rizwan Nedîmî bi teqekirin ji ser, zik û pêyên wê hatiye kuştin.

Wê çavkaniya haydar di berdewamiyê de got: Termê Rizwan Nedîmî bo nexweşxaneya Sîna ya Kamêranê hatiye veguhastin û heta niha radestî malbatê nehatiye kirin.

Rizwan Nedîmî temen 26 salî bû û xwediyê keç û kurekê bû.

# Kurd hertim bûne mertal bo dagîrkeran



N: Hesen Mukerem

Gelê Kurd hertim di mêrxasî, egîdiya xwe li şeran de, bêmînak bûne û dagîrkeran jî tehemula dîtina vê yekê nebûne û her ji ber hindê jî, dema ku em dîroka Kurdan dişopînin dibînin bi perçekirin û sirgûnkirinê hertim hewl dane ku Kurdan ji hev dûr bixin û li cihên wisa an sînûrên destkird de akincî bikin da ku ew ji hev dûr bin û hem jî wek mertalekê li hember rikeberiyên siyasî û desthilatî yên xwe de bikar bînin bo mînak, Împiratorya Mêda (paşwextya Îran)ê heger li Rojavayê sînorê xwe bi rêzeçîyayên asê – Zagrosê ve parastî bûye, lê sînorê Rojhilat, erdê bê çîya bûye, û ber êrîşên Tûranîyan: Turk-selcuq û Teter-moxolan hertim vekirî bûye, ji ber vê sedemê hertim gefa êrîş û dagîrkariyê li ser Îranê bûye.

Hikumdarên wî serdemî yê Îranê ji ber parastina sinûrên xwe siyaseteke duserî li hember Kurdan de bikar anîne, bi sed hezaran Kurd koçberî Xorasanê kirine da ku weke mertala asê bo parastina sinûran bikar bînin, û bi aliyê navxwe de jî, pêşya egera her cure xebatekî wan û serhildanê ji Kurd bigrin, bi armanca parastina cihwarên nû yên ku tê de hatine akincîkirin, li hember êrîşên hêzên çekdar û Tûraniyan rawestin û ew siyaseta duserî li Îranê derheq eşîrên Kurdan heta dema deshilatdariya Şah Îsmayîl, Şah Ebas û Nadîrşah û niha jî Komara Îslamiya Îranê hem li Xorasan û hemî li Rojavayê Îranê yanî Rojhilatê Kurdistanê berdewam e.

Li Rojavayê Kurdistanê, di çend salên borî de di dema şerê DAÎŞ`ê de, Beşar Esed serkomarê Sûriyê, herêmên Kurdan terkandin û şer û ewlehiya vê xist destê hêzên Kurdan û meydan da Kurdan da ku Herêmên gefa şer li ser in, Kurd biparêzin û di wî şerî de keç û xortên Kurdan bi hêz û gernasiya xwe li hember DAÎŞ sekinîn û bi hezaran şoreşwanên Kurd bûn mertal bo Beşar Esed û piştî bidawî hatina şer jî, Beşar Esed rê bo artêşa Tirkiyê vekir û dewleta Tirkiyê û girûpên girêdayî bi dewleta Tirkiyê re, bajarên Kurdan kirin meydana xwe û her carê bi hinceteke ev herêm bombebaran kirin.

Lê, ev fêlbazî û siyaseta duserî tenê li Rojavayê Kurdistanê bidawî nebû, dagîrkeran berahîka şerê DAÎŞê ber bi Herêma Başûrê Kurdistanê ve zivirandin, Başûrê Kurdistanê ku hîn birînên wê yên ji ber dagîrkeriya Sedam Husên nojdar nebibûn, ev tûşî şerê DAÎŞê kirin û bi hezaran pêşmerge ji bona parastina Herêm û destkevtên Kurdan li vê perça Kurdistanê, di wî şerî de şehîd bûn û bûne mertal bo bajarên Ereban, û Kurdan di wî şerî de gelek şehîd dan her wekî ku li dîrokê de xuya ye, Kurdan hertim mêrxasî û egîtiya xwe parastine.

Herêma Kurdistanê her li ser wê hesabê li sala 2017`an de refirandoma serxwebûnê birêve bir û bi piraniya dengan %93 xelkê Kurdistanê dengê erê ji bona serxwebûna Kurdistanê dan.

Lê, berçavtengiya dujmanên gelê Kurd çavê xwe li ser hemû cangorî û malwêraniyên Kurdan li hember şerê DAÎŞê girtin û Herêma Kurdistanê tehrîmkirin û Herêm xistin di bin dijwartirîn givaşên aborî û siyasî de, lê piştî derbasbûna çend salan welatên Ewropî û Amerîka ku ji ber berjewendiyên xwe peywendî digel Kurdistanê digrin, dibe ji wan re zelal bibe ku ti netewєyek an dewlet weke Kurdan rû rast an jî ewleh nine bo wan, wan dubare bi şandana balyoz û seredanên berdewam hewl dan pêwendiyên xwe digel Kurdistanê geş bikin û li kêleka seredanên xwe bo Bexdayê hevdem seredana Hewlerê jî dikin, ev dostatî û hevpeymaniya bi bê siyaseta duserî ya Kurdan heta Wezîrê derwe yê berê yê Amerîkayê Pompeo jî di heyama çend rojên derbasbûyî de di nivîsekê de îşare pê kiriye.

Îca em dubare werin ser rewşa niha ya Rojhilatê Kurdistanê bisekinin, çawan min li jorê jî qala vê yekê kir ku, Kurd hertim bûne mertal bo neteweyên serdest an heman Fars û Tirk û Ereban, li şoreşa nû ya Rojhilatê Kurdistanê de, ku bi Kuştina keça Kurd “Jîna Emînî” bi destê hêzên serkutker yên rejîma Îranê serîhilda, gelê Kurd li bajarên Rojhilatê Kurdistanê, bi keç û kur, ciwan û kal derkevtin ser şeqaman û bi hemû hêza xwe li hember cinayetên rejîma hov rawestan, lê hêzên rejîma Axûndî jî herçawan li tevahiya temenê xwe yê bîyom de rehm bi mirovhiyê nekiriye, li bajarên Kurdistanê bi çekên giran êrîş kirine ser xelkê bê mertal û dest vala, û li Mihabadê, bajarê Pêşewa Qazî Mihemed yekem serkomarê Kurdistanê, bi doşkayê teqe li xelkê dest vala kirin ku tenê daxwaza mafê rewa, mafê mirovahiyê xwe dikirin ku mafê her kesî ye, û bi sedan keç û xortên Kurdan birîndar û şehîd kirin û bi hezaran jî binçavkirin, ya herî balkêş eve ku rejîma Îslamî ku li ser navê ayîna Îslamê hikûmerdariyê dike, heta rehm bi mela û kesayetiyên Olî yên Kurdan jî nekir ku tenê ji rejîmê daxwaz kiribûn ku dev ji kuştin û revandina ciwanên Kurd berde, lê ev bikom binçavkirin û cezayên giran li ser wan sepandin.

Tiştek din a balkêş eve ye ku, her ev xwenîşandan li bajarên Farsan jî hebû lê, neteweya Fars weke berê Kurd kirin pêşengê şoreşê, mîna Kurdan dernekevtin û li hember cinayetên rejîmê de xwenîşandan nekirin, an rejîmê ew weke gelê Kurd serkut nekirin û nake û nakuje û bajarên Farsan milîtarize nake.

Rejîmê hertim Kurdistan bixwe weke meydana şer, meydana cerbandina çekan an meydana meşqa leşkerî hesab kiriye, bo mînak Qirargeha Hemze a Spaha Pastarana terorîst, taybet bo Kurdistanê avakiriye û ji rêya vê qerargehê ve bi hemû hêz û şiyana xwe bajarên Rojhilatê Kurdistanê milîtarîze dike, heta me dît her vê Spaha Pasdaran bi mûşekên balistîk û dronên xweteqîner êrîş kire ser binke û bargehên hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê û kempên sivîl yên malbatên wan li nava kûrahiya axa Başûrê Kurdistanê, û bi bê berçavgirtina yasayên navdewletî, serweriya Herêma Kurdistanê bin pê kir û xaka Herêmê bo çendîn caran bombebaran kir.

Ev hemû êrîş û kiryarên serkutker ne nîşana bihêzbûna dagîrkeran e, belku ev nîşana berçavtengiyê ye.

Di dawiyê de dikarim bêjim, dema ku hêz, qawet û yasa û însaf li destê dagîrker de ye, rewşa heyî jî encama kiryarên wan e, û bi danaberhev a reftarên berdewam yên dujmn yên di heyama wan salên derbasbûyî de, nîşan dide ku dê berdtekên tundtir û berdewamtir di paşerojê de li pey xwe hebin û em dikarin bêjin ku nifşa ku niha dagîrker digel de rû bi rû ye, hilgirê mîrata hêviyên sê nifşên borî ye.

Hekî heta niha dujminan karîne bi siyaset û pîlanên qirêj yên xwe Kurdan weke mertala parastina xwe bikar bînin, divê Kurd bi hişmendî û yekitî û yekrêziya xwe, niha pêde bibe mertala parastina xwe û nabe çiyê din îznê bidin ku dujmin wan bo armancên xwe bikar bîne.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Îlam; Cezayê hepsê û cezayên zêde ji Ayet Arifîniya re hat birîn tin

Ayet Arifîniya xwandekarê fekolteya maf û birêveberê kanala telegram ya bi navê "Abdanan li guzera zeman de", ji aliyê taya yek ya dadgeha Şoreşa Îlamê bi serokatiya dadwer "Receb Mihemedî", 6 sal û 7 meh û 15 roj heps û du sal qedexeya derkevtin li welat hat cezakirin.

Ew çalakvanê medenî bi tohmeta "birêvebirina kombûnan bi armaca têkdana ewlehiya welat", 6 sal heps(ku 3`ê salên wê ragiriye) û "çalakî û propagende li dijî nizamê(ji rêya avakirina kanala telegramî)" bi 7 meh û 15 roj girtîgehê hatiye cezakirin.

Di berdewamiya vê cezayî de, pasaporta navbirî jî dest bi serde hatiye girtin û cezayê dernekevtina du sal li welat jî bo hatiye birîn.
Ew cezaya li rêkevta 2`ê Befranbarê hatiye danê û 40 rojan piştî dana wî cezayî ji navbirî re ragihandin e.

Ayet Arifînya roja Sêşemî 11`ê Rêbendanê bi rêya telefonê cezayê hatî dan li dadgeha destpêkî de ji malbata wî re hatiye ragihandin.

Ayet Arifînya xelkê Abdananê ye û roja Duşemî 9`ê Xezelwerê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin û li girtîgeha navendî ya bajarê Îlamê de ye û heta niha dadgehê azadiya demkî ya wî bi danîna barimteyê erê nekiriye.

## Hesina (Kejal) Vetenpûr bo birêveçûna cazaya girtîgehê bo girtîgeha Îlamê veguhastin

Roja Şemî 8`ê Rêbendanê, Hesina (Kejal) Vetenpûr, şivêrmenda maf û çalakvana mafê jinan bo birêvebirina cezayê hepsê bo girtîgeha Îlamê veguhastin.

Ew çalakvana mafê jinan ji aliyê taya 3`ê ya dadgeha Şoreş a Îlamê bi salek girtîgeha te`izîrî, 6 meh girtîgeha ragirtî, betalkirina pasaportê û 1100 demjmêr şivêrmendiya maf bi bê beramber hatiye cezakirin.

Dadgehê Hesina (Kejal) Vetenpûr ku di hewzeya jinên tundûtîjî dîtî de çalak e, bi "propagende li dijî nizamê, kombûn û tebanî li dijî ewlehiya navxwe û derve û herwisa alozî di nezima giştî de" tohmetbar kiribû.

Herwisa dadgehê tohmetên weke "endambûn di yek ji partiyên Kurdî de, lîderiya xwenîşanderan û bêrêzîkirin bi rêberê hikûmeta Îranê" ji wê welatiya Kurd, lêborîne.

Cezaya dadgeha destpêkî ya wê çalakvana mafê jinan li dadgeha pêdaçûnê de her weke xwe hatiye pejrandin û navbirî di heyama dewrên dadgehê de ji mafê destpêragihştin bi parêzerê destnîşankirî bê par bûye.

Hesina (Kejal) Vetenpûr roja Çarşemî 31`ê Xermananê di pêvajoya xwenîşandanên Îlamê de ji aliyê îtla`ata Spahê ve bi lêdan û azar danê, hatibû binçavkirin û bo girtîgehê veguhastibûn.
Herwisa di dema binçavkirina navbirî de, hêzên serkutker bi batom û qundaqên çekê li navmil, dest, û derbên pey hev li kêleg û zarokdana wê xistibûn.

Her di vê pêwendiyê de, telefon, karta pênase û karta hesaba bankî ya wê welatiya Kurd di dema binçavkirina wê de ji aliyê hêzên ewlehî û serkutker ve dest bi ser de hatiye girtin.

Ew şivêrmenda mafî piştî bidawîbûna dewrên lêkolînê û îşkenceyên tund, ji bo vergirtina îtrafên bizorê li girtîgeha îtla`ata Spahê bo benda Nisivana girtîgeha navendî a Îlamê veguhastine û li rêkevta 24`ê Xezelwerê bi danîna barmteyê û kefaletê hatiye azadkirin.
Hesina (Kejal) Vetenpûr, temen 29 saliye û xelka bajarê Gêlanxerba ser bi parêzgeha Kirmaşanê ye.

## Binçavkirina Seyîd Tariq Husênî, xwandekarê zanista Olî li Ciwanroyê

Roja Yekşemî 9`ê Rêbendanê Seyîd Tariq Husênî, xwandekarê zanista Olî li bajarê Ciwanroyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin.

Hêzên ewlehî bi bê nîşandana belgeyên yasayî êrîşkirine ser mala wî û bi şikandina camên derî û pencereyên malê, hundrî malê bûne û navbirî binçavkirine.

Pêka gotina çavkaniyek haydar, Seyîd Tariq Husênî, piştî binçavkirinê bo lêkolînkirinê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Kirmaşanê veguhastine.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, li derheq sedema binçavkirin û tohmetên ku li idjî Seyîd Tariq Husênî hatine sepandin ti zanyariyek ber dest nine.ewlehî yên hikûmetê ve hatin binçavkirin û bo cihek nexya hatine veguhastin.

Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (439)

# Wênwyên erdhej berketiyên bajarê Xoyê









